

**Rewşa Nivîs û  
Nivîskariya  
Kurdî li Tirkîyeyê**



# Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî

Rewşa Nivîs û Nivîskariya Kurdî li Tirkîyeyê

Omer FÎDAN

Amed, Berfanbar 2020

## ÇAVDÊRIYA MAFÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ

Rewşa Nivîs û Nivîskariya Kurdî li Tirkîyeyê

Amed, Berfanbar 2020

**Nivîskar:**

Omer Fîdan

**Edîtor:**

Ulaş Güldiken

**Mîjanpaj:**

Zafer Tüzün

### Tora Ziman û Çanda Kurdî

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E  
Kayapınar - Diyarbakır

Web: [www.torakurdi.org](http://www.torakurdi.org)  
E-mail: [info@torakurdi.org](mailto:info@torakurdi.org)  
Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berê Her Tîştî Zarok berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

## Naverok

Kurte .....	6
Destpêk .....	7
<i>Armanç</i> .....	8
<i>Komên Hedefkirî</i> .....	8
<i>Çarçoveya Xebatê</i> .....	9
Cihê Nivîs û Nivîskariya Kurdî di Qada Hiqûqa Navneteweyî de .....	9
Rêbaz .....	12
Pirsgirêkên Sereke yên Nivîskariya Kurdî .....	13
Çend Mînakên Binpêkirina Mafên Zimanî .....	16
Pêşniyazên Çareseriyê .....	18
<i>Pêşniyazên ji bo reformên siyasî</i> .....	18
<i>Pêşniyaz ji bo aktorên civaka sivil</i> .....	18
<i>Serencam</i> .....	20
<i>Çavkanî</i> .....	21
Pêvek 01: Nivîskarên Kurdî nûsên di Girtîgehan de .....	23
Pêvek 02: Hinek Pirtûkên Kurdî yên li Tirkiyeyê Hatine Qedexekirin .....	26



## **Kurte**

*Di vê kurterapora li ber destên we de hewleke çavdêriya mafên zimanî ya di qada nivîs û nivîskariya Kurdî de heye. Wek hemû qadên din ên jiyane, di atmosfera heyî ya li Tirkîyeyê de, di vê qadê de jî gelek bînpêkirinên mafan ên azadiya xwederbirînê, azadiya ramanê, nivîsînê çêdibin; sansur, qedexe, pêkutî, êrîş û girtin her roj hinekî din sînoran li vê qadê teng dikin. Piştî civîn û hevpeyvînên rû bi rû û nivîskî yê bi çend nivîskarên xemxur û xîretkêşên Kurdî yê xwebexş û berketî û lêkolîneke qadî ev rapor hat amadekirin. Li gel ku hemû kêşe û arîşeyên vê qadê di bîngeha xwe de ji ber nenasiya nasnameya Kurd û nebûna statuyeye fermî ne jî, pîrsgirêkên wek krîmînalîzekirina nivîs û nivîskariya bi Kurdî, tengbûna bazara Kurdî, nebûna perwerdehiyeye berbelav, lawaziya xebatên parêzvaniyê yê di qada siyasî û civakî de, bêpergalî, nebûna saziyên qadî û lawaziya hevkarî û hevgirtinê sînorên vê qadê tengtir dikin. Encax piştî tesbît û raporkirinên bi rêk û pêk ên van pîrsgirêkên zagonî, civakî û aborî, bi reformên siyasî yê wek bidestxistina statuyeye fermî ya ji bo nasname û zimanê Kurdî, perwerdehiya bi Kurdî ya berbelav, cudakariyeye erênî ya ji bo Kurdî, xurtkirina mafên xwederbirînê û rakirina qedexeyan ev kêşe û arîşe dê bikaribin bî çareserkin. Li gel van pîrsgirêkên derveyî yê ku divê bi destê rêveberên giştî bî çareserkin, ji bo ku rayedar neçarî van guherînan bibin, barê herî giran dikeve ser milên aktorên civaka sivîl. Ev aktor divê bi dîplomasiyeye navxweyî û navneteweyî ya xurt parêzvaniyeye neteweyî û navneteweyî bikin, di sazî û dezgehên sivîl û siyasî de duzimaniyeye<sup>1</sup> defakto bîsepînî, ji bo bilindkirina prestîja Kurdî ya di nava gel de hewl bidin û ji bo berbelavkirina hişmendiyeye xurt a xwedîlêderketina ziman û çandê bi awayekî bandorker çapemenî û ragihandinê bi kar bînin.*

<sup>1</sup> Bi peyva 'duzimaniyê', ji bo Tirkîyeyê, Kurdî û Tirkî tî qestkirin. Dema ku 'Kurdî' jî tî gotin bêguman bi hemû devok û zaravayan ve Kurdî tî qestkirin. Divê bi tu awayî tîkîliya Kurmancî û Kirmanckî wek tîkîliya Kurdî û Tirkî ya heyî nebe.

## Destpêk<sup>2</sup>

Peywira herî mezin a nivîsê ew e ku ramanê mayînde dike, vediguhêze û belav dike. Nivîs di nava nifşan û gelan de dibe pir û danasîna çandî dike. Xebatên ku di qada nivîskariyê de tên kirin nasnameya civakê jî diparêzin û xwedîderketina li deng, reng û hestên neteweyî xurtir dikin. Bêguman ji ber ku Kurdî bi awayekî taybet û sistematîk rastî êrîşên tunekirinê tê, nivîsandina bi Kurdî di heman demê de helwesteke dekolonyal e. Berxwedêrî û serhildêriyeke li hemberî mêtîngeriya bi xwe ye.

Nivîsîn, li gel perwerdehî û ragihandinê, standardîzasyona di zimên de pêk tîne. Ji ber ku perwerdehiyeke navendî ya bi Kurdî li Tirkîyeyê tune ye, ji bo standardîzasyona di zimên de, barê herî giran dikeve ser milê nivîskar û weşanxaneyan. Nivîsîn her wiha ji bo parastina zimanê heyî û geşkirina zimanekî jî amûra sereke ye; biwêj û gotinên pêşyan ên ku neynika çandê ne, nêrîna gelekî ya li jiyane ne, diparêze. Peyvên nû li zimên zêde dike, ‘sînoren jiyane’ berfireh dike.

Ji ber vê girîngiya xwe, dibe sedem ku dewlet bi zimên û nivîsînê re mijûl dibe. Rêveberiyên serdest dixwazin azadiya ramanê ji holê rakin û rejîmên otorîter damezirînin. Di vê serdema ku em tê de dijîn de jixwe ev yek awayekî nû yê ‘mêtîngeriya’ ye. “Zimanê ku di tevahiya dîrokê de, di dagirkirina mêjiyan de xwedîbandor bûye, di xespkirina axê, serxwebûnê û mafan de her û her bûye hêmaya/qonaxa pêşîn.”<sup>3</sup> Skutnabb-Kangas û Phillipson (1995) jî dibêjin “*Mêtîngeran berê ax, av û çavkaniyên xwezayî yan jî bedena kesên ku bindestên wan in (hêsîrtî/koletî) dimêtin lê niha bi alîkariya alavên endustriya zanîne yê wek perwerdehî, amûrên ragihandina giştî, ol, hwd hewl didin ku mêjiyê mirovan bimijin, dagir bikin.*”<sup>4</sup> Li Tirkîyeyê jî sepanên siyasî yê ku ji

2 Ji bo amadekirina vê kurteraporê gelek kesan hewl û piştgirî dan. Ji bo alîkarî û piştgiriya wan, di serî de Komîteya Birêvebir a Giştî ya Navenda PENa Kurd, Dr. Cuma Ççek, Savaş Dede, Roza Metîna û Cevahîr Sadak Duzgun, mala hemû dildar û dilsozên Kurdî dîsa û her ava be.

3 Netîce Altûn Demîr, “Zimanê Dayîkê, Girîngiya Wî, Têkoşîna ku li Tirkîyeyê Tê Dayîn, Xebatên ku Hatine Kirin,” *Jineoloji* 13 (2019): 127-138.

4 Tove Skutnabb-Kangas & Robert Phillipson, “Linguicide and Linguicism”, R. Phillipson&T. Skutnabb-Kangas (Eds.), *Papers in European language Policy*. Roskilde: Roskilde Universitets center, Lingvistgruppen, 1995), 83-91.

aliyê rêveberiya otorîter ve tèn kirin, bi vê armancê tèn kirin û bêguman nivîskarên Kurd jî bi ber çerxa van sepanan dikevin û heman mêtîngerî di qada nivîs, ziman û çandê de jî bi awayê herî dijwar tê dîtîn.

## **Armanc**

*Projeya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî* bi armanca parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî ji aliyê Komeleya Berî Her Tiştî Zarok ve bi hevkarîya Tora Ziman û Çanda Kurdî hatiye amadekirin. Di çarçoveya vê projeyê de heta niha pênc raporên tematîk ên çavdêriya mafên zimanî û çandî hatine amadekirin û belavkirin.<sup>5</sup> Ev rapora li ber destê we, ya şeşemîn e ku di çarçoveya vê projeyê de hatiye amadekirin. Armanca vê rapora li ser nivîs û nivîskariya Kurdî li Tirkîyeyê ev e ku di çarçoveya mewzûata neteweyî û hiqûqa navneteweyî de tesîra polîtîkaya yekzimanî li ser mafê bikaranîna zimanî di qada nivîs û nivîskariyê de, her wiha bînpêkirin û pîrsgirêkên sereke yên ku di vê qadê pêk tînin raxe ber çavan. Bike ku berpirsiyarên bînpêkirinan hîn bêhtir ji qada gelemperî/cemawerî re vekirî bin û hesab bidin. Rapor her wiha ji xwe re kiriyê mebest ku hem ji bo sazîyên civaka sîvil hem jî otorîteyên cemawerî pêşniyazên siyasî bi pêş bixin da ku hewldanên takekesî û komî ji bo başkirin û bipêşxistina mafên mirovan xurt bikin.

## **Komên Hedefkirî**

Sazîyên cemawerî/gelemperî û berpirsiyariyên siyasî yekemîn koma hedefkirî ne. Ji ber ku rapor di çarçoveya hiqûqa neteweyî û navneteweyî de berpirsiyariya van aktorên tîne bîra wan û di qada nivîs û nivîskariyê de bala wan dikişîne ser mafên zimanî. Her wiha hin pêşniyazên siyasî pêşkêşî wan dike da ku mafên zimanî xurt bibin. Duyemîn koma hedefkirî ya vê raporê aktor û sazîyên nivîs û nivîskariya Kurdî ne. Nivîskar û weşanxaneyên Kurdî; her wiha sazî û dezgehên sîvil ku ji bo xurtkirina nivîs û nivîskariya Kurdî hatine damezrandin dikevin nav vê komê. Rapor dike ku pîrsgirêkên van koman hîn bêhtir û baştir di qada cemawerî de bînin dîtîn. Her wiha pêşniyazên siyasî jî pêşkêşî van aktorên dike da ku xebatên wan ên parêzvanîyê ji bo bikaranîna zimanê Kurdî xurttir bibin û bi pêş bikevin. Koma dawî ya hedefkirî xwîne-

5 Omer Fidan, *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020); Omer Fidan, *Nirxandina Rapirsîna Tora Ziman û Çanda Kurdî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020); Omer Fidan, *Rewşa Ziman û Perwerdehiya bi Kurdî li Tirkîyeyê* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020); Savaş Dede, *Rapora Zarok û Mafên Zimanî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020); Savaş Dede, *Rapora Tenduristî û Mafên Zimanî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020). Ev rapor li ser malpera Tora Ziman û Çanda Kurdî vekirî ne. Binêrin: [www.torakurdi.org](http://www.torakurdi.org)



rên Kurdî bi xwe ne. Ji ber ku yekemîn beşa ku ji xebatên nivîs û nivîskariya Kurdî sûd werdigirin ew in. Yan jî dema mafê zimanî di qada nivîs û nivîskariyê de tên binpêkirin, yekem koma ku mafên wan tên binpêkirin xwîner bi xwe ne.

## **Çarçoveya Xebatê**

Çarçoveya vê raporê ji aliyê esasê ve nivîs û nivîskarî ye. Ji ber vê yekê di bin-geha xwe de nivîskar û berhemên wan, her wiha weşanxaneyên ku berhemên bi Kurdî çap dikin dihewîne. Her çî qas armanc ev bû ku ev xebat di qadeke berfireh de bê kirin, şert û mercên ji ber pandemiyê rê nedan vê yekê û xebatên çavdêriyê ji/li Amedê hatin kirin. Ji ber vê yekê ji aliyê cih û war ve çarçoveya cih û war di esasa xwe de Amed e. Li gel vê yekê, rapor daneyên ji tevahiya Tirkîyeyê di nava xwe de dihewîne, nirxandin jî li ser tevahiya Tirkîyeyê tên kirin. Ji ber ku pirtûkên weşanxaneyên Kurdî li gel bajarên Kurdistan li metropolên Tirkîyeyê jî, bi taybetî li Stenbolê jî, tên firotin. Her wiha nivîskarên Kurd li gel bajarên Kurdistan li bajarên din ên Tirkîyeyê jî tên xwendin. Dîsa di komcîvana onlîne de nivîskar ji Stenbol, Îzmîr, Bedlîs, Semsûr û Rihayê jî beşdar bûn. Her du civînên onlîne yê Navenda PENa Kurd û PENa Navneteweyî de ku di çarçoveya xebata çavdêriyê de beşdarî çêbû, nivîskarên ji derveyê Tirkîyeyê jî beşdar bûn.

## **Cihê Nivîs û Nivîskariya Kurdî di Qada Hiqûqa Navneteweyî de**

Ji bo ku di qada nivîsîn û nivîskariya Kurdî de çavdêrî bi awayekî bi pergaltir bê nirxandin, li vê derê em ê derbarê têgînên azadiya ramanê û xwederbirîne yê di hiqûqa navneteweyî de û di bikaranîna vê azadiyê de mafê zimanê dayîkê de analîzeke sînorkirî bikin.

Xala 19'emîn a Daxuyaniya Gerdûnî ya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî bêyî ku tu sînoran deyne mafê "Azadiya ramanê û azadiya xwederbirîne yê her kesî" nas dike.<sup>6</sup> Xala 19'emîn a Peymana Mafên Sivîl û Siyasî li gel ku wan mafan nas dike jî, hinek sînoran jê re datîne. Li gor 19/3'yan di çarçoveya şert û mercên ku bi zagonan hatine diyarkirin de ji bo parastina rêza li hemberî nav û dengê kesên din, ewlehiya neteweyî, tenduristiya gel û exlaqê giştî ji vî mafî re dikare sînor werin danîn. Her wiha Xala 20'emîn a heman peymanê bangewaziya şer û vegotina nefretî di çarçoveya vî mafî de nanirxîne.<sup>7</sup>

6 United Nations, "Universal Declaration of Human Rights," 10.12.1948, <https://www.un.org/en/universal-declaration-human-rights/>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

7 United Nations, "International Covenant on Civil and Political Rights," 16.12.1966, <https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/ccpr.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

Xala 10'emîn a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) derbarê azadiya xwederbirînê de ye û hinek sînoran datîne.<sup>8</sup> Li gor vê xalê, "mafê xwederbirînê yê her kesî heye" lê ev mafê ku "peywir û berpirsiyariyan dide" bi zagonê hatiye diyarkirin û di civakeke demokratîk de divê ne li dijî "ewlehiya neteweyî, ewlehiya gel, pergala gel, bergiriya kirina tawan, parastina tenduristî û exlaq û parastina maf û azadiyên kesên din" be. Li gel vê yekê, dema ku li biryarên berê yê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) bê nihêrîn, dê bê dîtîn ku encax di rewşên pir taybet de ji azadiya xwederbirînê re sînor hatine danîn.<sup>9</sup> Li gor vê yekê, danîna sînoran a ku di zagonê de bi zelaî hatiye vegotin, divê li gor armancên vê xalê bin, nakokî di navbera wan û nirxên demokratîk de tune be û bi armancê re lihevkerî bin.

Xalên 25'emîn û 26'emîn ên Destûra Bingehîn a 1982'yan ji bilî vegotinên wek "yekîtiya dewlet û gel a ku nayê parçekirin" ên ku nikarin di rejîmên bisînorkirina hinek mafan a hiqûqa mafên mirovan a navneteweyî de cih bigirin, sererastkirinên hevterîbê peymanên ku li jorê behsa wan hat kirin, di hundirîn. Lê, bendên din ên Xala 28'emîn a ku bi "çapemenî azad e, nikare were sansurkirin" dest pê dike, rasterast çawaniya kirina sansurê vedibêjin. Divê mirov bibêje ku di navbera salên 1959 û 2019'an de, bi 356 mehkûmkirinan, welatê ku ji aliyê DMME'yê ve derbarê azadiya xwederbirînê de herî zêde hatî mehkûmkirin Tirkîye ye<sup>10</sup> û di vî warî de welatê duyemîn ê cîhanê, bi 72 mehkûmbûnan Rûsya ye. Her wiha divê mirov bi taybetî jî diyar bike pi-raniya serlêdanên ku ji 2015'an vir ve hatine kirin jî di pêvajoya biryarê de ne.

DMME'yê di biryara xwe ya ku ji bo doza Alinak V Tirkîyeyê di 2005'an de daye de gotiye ku berhevkirina pirtûkan binpêkirina Xala 10'emîn a PMME'yê ye. Di heman biryarê de bi taybetî hatiye gotin ku "tu şik û guman tune ye ku berhevkirina pirtûkan binpêkirina azadiya çapkirina belge û pirtûkan a serlêder e û ev yek jî aliyekî bivênevê yê azadiya ramanê ye."

8 Council of Europe, "European Convention on Human Rights," 4.11.1950, [https://www.echr.coe.int/Documents/Convention\\_ENG.pdf](https://www.echr.coe.int/Documents/Convention_ENG.pdf), dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

9 Wek mînak, di Biryara Handyside V Keyaniya Yekgirtî ya 1976'an de gotiye azadiya ramanê "ne bi tenê ji bo raman û agahiyên ku aligir û piştgir tînin dîtîn an jî bêzîrar û bêwate tînin dîtîn, di heman demê de ji bo raman û agahiyên ku li dijî dewletê yan jî beşeke civakê ne, ji bo wan bandorker in û wan aciz dikin jî tê gotin" û ev biryar bûye yek ji pêwîstên biryara Dadgeha Destûra Bingehîn a der barê Zubeyde Fusun Ustel û yê din de. (R.G. Mêjû û Hejmar: 19/9/2019 - 30893). Dîsa, DMME'yê di biryara Ozturk û Tirkîye ya 2005'an de berhevkirina pirtûkan a bi hinceta propogandaya rêxistineke "terorî" li hemberî azadiya ramanê dîtîye. Dadgehên Tirkan, parastina xwe bi jêderkên ku ji pirtûkên Serokê PKK'yê Abdullah Ocalan, İsmail Beşikçi, Gunay Aslan girtine, kirine. Lê DMME'yê biryar daye ku birîna cezayê pere û girtîgehê yê ji bo xwedyê/a weşanxaneyê û berhevkirina pirtûkan binpêkirina azadiya ramanê ne. Li gor DMME'yê kiryarên ku hatine kirin li hemberî *nulla poena sine lege* (rêgeza bêyî zagonan tawan û ceza nabin) û "pêdiviyên di civakeke demokratîk de" ne.

10 European Court of Human Rights, 2020. "Overview 1959-2019," 2020, [https://echr.coe.int/Documents/Overview\\_19592019\\_ENG.pdf](https://echr.coe.int/Documents/Overview_19592019_ENG.pdf), dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

Mijareke din a hiqûqa navneteweyî ya ku têkildarî nivîsîn û nivîskariya Kurdî ye jî mijara mafên zimanî yên kêmaran e. Xala 2'yemîn a Daxuyaniya Gerdûnî ya Mafên Mirovan a ku di bin banê Neteweyên Yekbûyî de hatiye amadekirin,<sup>11</sup> Xala 27'emîn a Peymana Mafên Sivîl û Siyasî, Peymana Navneteweyî ya derbarê Jiholêrakirina Hemû Cure Cudakariyên Nijadî de,<sup>12</sup> Xalên 2'yemîn, 17'emîn, 29'emîn û 30'emîn û Beşa Destpêkê ya Peymana derbarê Mafên Zarokan de,<sup>13</sup> Xala 14'emîn a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê ya ku di bin banê Konseya Ewropayê de hatiye çêkirin, Peymana Çarçoveyî ya ji bo Parastina Mafên Nete- weyî yên Kêmaran,<sup>14</sup> Şertê Ewropayê yê Zimanên Herêmî û Kêmaran<sup>15</sup> hinek ji peymanên navneteweyî ne ku di vê qadê de hatine çêkirin.

Dem a ku mirov li peymanên ku derbarê zimanên kêmaran de hatine çêkirin dinihêre, mirov dibîne ku di bingehe de armanca wan parastina zimanên kêma- ran û mijarên wek nijad, zayend, ol ên kêmaran e. Astengkirina mafên zimanî, di civakekê de, di serî de komên etnîkî an jî nasnameyên din, dibe sedem ku komên cuda di gelek waran de, di heman demê de tûşî bînpêkirina mafan bibin. Di vê mijarê de yek ji mînakên herî balkêş jî bergiriya li hemberî maf an jî kirinên derbarê nivîs û nivîskariyê de ye. Ji ber vê yekê, wek mînak, beşa (d)'yê ya Xala 7'emîn a Şertê Ewropayê yê Zimanên Herêmî û Kêmaran dike ku dewlet bika- ranîna nivîskî û devkî ya zimanan hêsan bike û teşwîq bike.

Li gel ku hemû cure bergirî û qedexeyên ku li hemberî nivîskaran û berhe- mên wan tên kirin pîrsgirêkên azadiya xwederbirînê ne, heke ku ev bergirî û qedexa ji bo nivîskarên Kurd û weşanên bi Kurdî bînin kirin, di heman demê de cudakarî ye jî. Li gor biryarên DMME'yê yên ku li jorê behsa wan hat kirin, azadiya xwederbirînê di çarçoveya hinek pîvangên diyar de û bi şîroveyên pîr teng dikare were bisînorkirin. Lê dîsa jî, di rejîma rewşa awarate ya piştî bû- yerên 15'ê tîrmeha 2016'an de bi sedan sazî û dezgehên ku di qadên azadiya ramanê, ziman û çandê de dixebitîn hatin girtin, pirtûk hatin berhev kirin û ni- vîskar ji azadiyê bêpar hatin hiştin.<sup>16</sup> Wek ku ji peymanên ku li jorê hatin behs-

11 United Nations, "The Universal Declaration of Human Rights."

12 United Nations, "International Convention on the Elimination of All Forms of Racial Discrimination," 21.12.2020, <https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/cerd.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

13 United Nations. "Convention on the Rights of the Child," 20.11.1989, <https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/crc.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

14 Council of Europe, "Framework Convention for the Protection of National Minorities," 1.11.1995, <https://www.coe.int/en/web/conventions/full-list/-/conventions/rms/090000168007cdac>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

15 Council of Europe, "European Charter for Regional or Minority Languages," 5.11. 1992, <https://www.coe.int/en/web/conventions/full-list/-/conventions/rms/0900001680695175>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

16 İnsan Hakları Derneği, "OHAL'de Türkiye Raporu" 26.10.2017, <https://www.ihd.org.tr/ihd-istanbul-subesi-ohalde-turkiye-raporu/> dîroka gihîştinê 26.12.2020.

kirin jî tê famkirin, qedexeya cudakariyê dikare wek parçeyekî hiqûqa li gor dab û nêrîtan were pejirandin. Kiryarên ku Tirkîye li hemberî nivîskarên Kurd û weşanên bi Kurdî dike rasterast binpêkirina hiqûqa navneteweyî ye.

## **Rêbaz**

Ev rapor di encama çavdêriya qada nivîsa Kurdî û nivîskarên Kurd de hatiye amadekirin. Ji bo amadekirina vê raporê sê rê û rêbaz bi hev re hatine bikaranîn. Di gava yekemîn de, ji ber pandemiya Covid – 19'an û bêderfetiya çêkirina civînên rû bi rû, civîna fokûsê ya maseya nivîskaran bi beşdariya 16 nivîskaran (3 jin, 13 mêr), 4 endamên sekreteryaya Tora Ziman û Çanda Kurdî (2 jin, 2 mêr) û şewirmendê projeyê bi awayekî onlîne hatiye kirin. Nivîskarên ku beşdarî vê civînê bûne, ew kes in ku ji destpêka avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî ve di nava vê xebatê de cih girtine, bi gelek awayên cuda, di binê banê sazî, dezgeh, platformên cuda de ji bo geşbûna nivîsîna bi Kurdî bi salan hewl dane û bi van hewlên xwe di dilê raya Kurdîhezan de xwediyê hez û rêzê ne. Di gava duyemîn de, şeş pirsên spesîfîk bi awayekî nivîskî ji beşdarên civînê re hatin şandin, hinekan ji wan beriya civînê û hinekan jî piştî civînê ev pirs bi awayekî nivîskî bersivandin. Bi giştî 16 formên nivîskî gihîştin ber destên me. Ev bersiv ji bo vê raporê bûn çavkaniyeye zelaltir. Di gava sêyemîn de, bi neh nivîskarên din re di çarçoveya heman pirsan de hevpeyvînên rû bi rû û onlîne ên yek bi yek jî hatin kirin.

Li gel ku heta niha li Tirkîyeyê gelek kom, platform, însiyatîf û saziyên nivîskaran hatine avakirin jî, daneyên şênber ên derbarê rewşa nivîskaran de ji aliyê van saziyan ve nehatine tomakirin û belavkirin. Ji ber vê yekê, ji bo xwegihandina agahiyên tekûz û hejmarî yên tomakirî yên di vê qadê de, li gel sê rêbazên li jor, amadekarê vê raporê beşdarî du civînên navneteweyî yên Navenda PENa Kurd<sup>17</sup> jî bûye. Civîna yekemîn 86'emîn Civîna Giştî ya PENa Navneteweyî<sup>18</sup> bû ku di navbera 2 û 6'ê sermawezê de bi beşdariya 90 navendên PENan û 296 beşdaran pêk hat. Di vê civînê de, raporên salane yên ku derbarê nivîskarên Kurd ên li çar aliyên Kurdistanê de hatin pêşkêşkirin, ew rapor ji aliyê komîteyên<sup>19</sup> Navenda PENa Kurd ve hatibûn amadekirin. Ji bo amadekirina vê rapora li ber destê we jî ji wan raporên sûd hat wergirtin. Civîna duyemîn, di çarçoveya 15'ê Sermawezê, Roja Nivîskarên di Zindanan a Navneteweyî de, bi mazûvaniya Navenda PENa Kurd, di 13'ê

17 Fidan, Omer, *Navendeke Çalak a PENa Navneteweyî*: Navenda PENa Kurd, <https://pen-kurd.org/despek/>, 15.12.2019

18 Ji bo agahiyên berfirehtir li 86'emîn Civîna Giştî ya PENa Navneteweyî binihêrin: <https://pen-international.org/who-we-are/annual-congress/2020>

19 Komîteya Nivîskarên ji bo Aştîyê, Komîteya Nivîskarên di Zindanan de, Komîteya Mafê Ziman û Wergerê, Komîteya Nivîskarên Jin, Komîteya Nivîskarên li Derveyî Welêt.

sermaweza 2020'an de hat lidarxistin.<sup>20</sup> Ji raya nivîskarên Kurd û nivîskarên navneteweyî gelek kes beşdarî vê civînê bûn û di vê civînê de li ser rewşa nivîskarên zindanî gotar hatin pêşkêşkirin û gotûbêj hatin kirin.

## **Pirsgirêkên Sereke yên Nivîskariya Kurdî**

Çavdêriya li ser nivîs û nivîskariya bi Kurdî nişan dide ku di vê qadê de gelek pirsgirêk hene. Çend pirsgirêkên sereke yên ku di civîn û hevdiîtan de derketin pêş ev in:

**Krîmînalîzasyona nivîs û nivîskariya bi Kurdî:** Li welatekî ku zimanek lê nîvqedexe be, nivîskar ditirsin ku dê ji ber nivîsîna bi Kurdî tiştek were serê wan. Ji tîrsa ewlehiya canê xwe gelek nivîsên xwe dadîqurtînin; di dilê her nivîskar/nivîshezekî/ê de 'lodên nivîsan ên ku bêhn didin' hene. Ji ber redkirin, reşkirin û qedexekirina înfomal a Kurdî û Kurdbûnê, civak xwe ji berhemên bi Kurdî dûr dixê û israra di Kurdî de wek helwesteke marjînal dimîne.

Di meseleya krîmînalîzasyonê de girtina nivîskarên Kurd, qedexekirina pirtûkên bi Kurdî û cezabirîna li weşanxaneyan bandoreke mezin li civakê dike. Li gorî agahiyên ku di xebatên çavdêriyê de hatin bidestxistin, îro, 43 nivîskarên Kurd di girtîgehê de ne (Binhêrin Pêvek 1). Her wiha di navbera 2016 û 2019'an de 109 pirtûkên weşanxaneyên Kurdî hatine qedexekirin.<sup>21</sup> Ji van pirtûkan 31 bi Kurdî ne (Binhêrin Pêvek 2). Ji ber van zordestiyan li ser nivîskar û pirtûkên Kurdî, li gel ku berhem û berhemdarî her ku diçe zêde jî dibe, di xwegihandina berhemman de hîna jî gelek kêşe û arîşe hene. Gelek berhem nayên peydekirin, gelek kes çêkirina pirtûkxaneyêke bi Kurdî ya di malên xwe de hîna jî ji bo ewlehiya canê xwe wek xetere dibînin. Li gel ku qadeke pir girîng a xwendin û nivîsandina Kurdî ye jî, sepanên di girtîgehê de dikin ku kesên di girtîgehê de ji berhemên derve bêpar bimînin, ên li derve jî ji berhemên girtiyan bêpar bimînin.<sup>22</sup>

**Tengbûna bazara zimanê Kurdî:** Di tevahiya cîhanê de çîna navîn xwendevan in, çîna navîn a Kurdan bi Kurdî kêmtir dixwînin. Dîsa, ji ber israra di înkara Kurdî de, Wezareta Çand û Turîzmê ya Tirkîyeyê jî pirtûkên bi Kurdî ji bo pirtûkxaneyan nastîne. Ev yek bandorê li ser bazar û rewacê jî dike, li ser teşwîq, moral û motîvasyonê jî dike. Li gel ku nivîsîn di ber xwe re karekî din qebûl nake jî hemû

20 Jin News, "PENa Kurd ji bo Roja Nivîskarên di Zindanan de bername li dar xist," 13.11.2020, <http://www.jinnews16.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/150883?page=18>, dîroka gihîştinê: 23.12.2020

21 Navenda PENa Kurd, "Pirtûkên li Bakur hatine qedexekirin", 15.11.2020, <https://pen-kurd.org/pirtuken-li-bakur-hatine-qedexekirin/> dîroka gihîştinê: 21.12.2020

22 Mezopotamya Ajansı, "Rayedaran 30 qolî pirtûkên girtiyan nedan wan û paşve şandin" 02.10.2020, <http://mezopotamyaajansi24.com/kr/HEM-NCE/content/view/111269>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020

nivîskar neçar in ku ji bo debara xwe karekî din bikin. Ji ber ku bazareke xurt a nivîsîna bi Kurdî nîn e, hem ji aliyê afrîneriyê ve û hem jî ji aliyê xwedîlêderketinê ve qelsiyek heye. Nivîskarên Kurd bi giranî bi refleks û motîvasyona parastin û xurtkirina zimên dinivîsin. Heta gelek caran ev dibe armanca yekemîn û ‘çawanî’ya nivîsê dikeve pêşiya ‘çî’yê; teşe ji naverokê girîngtir tê dîtin. Ango gelek caran xemxuriya parastina zimên di ser naverok û armanca nivîsê re tê dîtin.

**Nebûna perwerdehiyê berbelav:** Nebûna perwerdehiya bi Kurdî ya berbelav kiriye ku zimanê Kurdî yê nivîskî wek zimanê komeke biçûk bimîne. Pirtûkên ku herî zêde tînin firotin pirtûkên fêrbûna Kurdî û ferheng in. Piştî van, pirtûkên ku herî zêde tînin firotin pirtûkên zarokan in ku tîraja ya ku herî zêde hatine çapkirin ji 7 hezarî derbas nebûye. Girtina saziyên ku perwerdehiya Kurdî didan<sup>23</sup> derbeke mezin li bazar û rewaca pirtûkên Kurdî xist. Lewra li gel pirtûkên fêrbûna Kurdî, ferheng û pirtûkên zarokan, pirtûkên wêjeyî yên ku her sal herî zêde tînin firotin in ku di mufredatên van saziyan de cih digirin.<sup>24</sup> Ji bilî van pirtûkan, pirtûkên wêjeyî yên ku ji 2 hezarî zêdetir belav dibin pir kêman in. Kovarên demkî yên ku çap dibin jî tîraja wan di navbera 1500 û 2500’î de ye. Rojnameya heftane ya bi Kurdî, Xwebûn a ku tîraja hejmara wê ya pêşîn<sup>25</sup> 4500 bû, niha daketiye 2000’an.<sup>26</sup> Dîsa xêzekovara Zirîng a ku tîraja hejmara wê ya pêşîn<sup>27</sup> 12000 bû, niha daketiye 3000’an.<sup>28</sup>

Dîsa jî, li gel hemû kêşe û arîşeyan, pêkutî û êrîşan jî, ji ber potansiyela bêhempa ya mijaran û pêdiviya bi nivîsînê, ezmûn û daneheva bi salan û xurtiya Kurdî, hejmara pirtûkên ku tînin çapkirin her sal zêdetir dibin. Li gor xebatên ku hatine kirin (dibe ku tê de ji %5-10 şaşî jî hebe) li Tirkîyeyê di sala 2016’an de 190, di sala 2017’an de 171, di sala 2018’an de 231, di sala 2019’an de jî 252 û di sala 2020an de 268<sup>29</sup> pirtûkên bi Kurmançî û Kirmançî jî aliyê weşanxaneyên cuda ve hatine weşandin.<sup>30</sup>

23 Saziyên wek Kurdî-Der (Li nêzî 40 bajar û bajarokên Kurdistan û Tirkîyeyê şaxên wê hebûn), TZP Kurdî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Kurd-Dera li Enqereyê, hwd ên ku bi Biryarnameyên bi Hukmê Zagonan (KHK) de hatin girtin.

24 Hinek pirtûkên wek Şivanê Kurd a Erebbê Şemo, Bîra Qederê ya Mehmed Üzün, Jana Gel a Îbrahîm Ehmed, Pêşmergeya Rehîmê Qazî, Helbestên Cegerxwîn, Şêrgeleya Arjen Arî, Janyaya Rênas Jiyan, Helbestên Ebdula Pêşew û Şêrko Bêkes û hwd ji ber ku di mufredatên saziyên perwerdehiya Kurdî de cih digirin, zêde tînin kirin.

25 Hejmara 1’emîn di 22.12.2019’an de belav bû.

26 Edîtorê Xwebûnê Çetin Altûn di hevpeyvîna bi wî re de dibêje çar sedemên wê yekê hene: 1 – Bi awayê dijital, li ser înternetê zêde tê xwendin. 2 – Ji ber pandemiya Covid-19’an belavkirina wê zehmet e û kêman bûye. 3 – Şirketên belavkariyê yên giştî yê Tirkîyeyê Xwebûnê belav nakin, hêza wan jî tune ye ku li her derê belav bikin. 4 – Ji ber tîrsa canê xwe gelek kes newêrin bistînin.

27 Hejmara 1’emîn di Kewçêra/Cotmeha 2019’an de belav bû.

28 Berpîrsê giştî yê Zirîngê Zeynel Bülût di hevpeyvîna bi wî re de dibêje ku sedemên daketina tîraja Zirîngê politîkayên ku li ser Kurdî tînin sepandin kirine ku gelek kes jî ber tîrsa canê xwe û karê xwe newêrin kovarê bistînin û dîsa pandemiya Covid-19’an jî di daketina tîrajê de bandorker e.

29 MedMuzik, “Vaye listeya pirtûkên kurdî yên di 2020’an de hatine çapkirin”, 01.01.2021, <http://medmuzik.tv/vaye-listeya-pirtuken-kurdi-yen-di-2020an-de-hatine-capkirin/> dîrok gihîştinê: 01.02.2021

30 Diyarname, “2018: Hemû Pirtûkên bi Kurdî yên ku Îsal Derketine”, 31.12.2018, <https://diyarname.com/news.php?ldx=33986>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020; Bîanet, “Diyarname: Di Sala 2019ê de 252 Pirtûk bi Kurdî Hatine Çapkirin”, 02.01.2020, <https://m.bianet.org/bianet/pirtuk/217971-diyarname-di-sala-2019e-de-252-pirtuk-bi-kurdi-hatine-capkirin>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

**Qelsbûna Xebatên Parêzvanîyê di Qada Siyasî û Civakî de:** Siyaseta Kurd mafên zimanî û çandî ji mafên bingehîn nabîne û nake yek ji rojevên xwe yên sereke. Her ku bişaftina berbelavbûyî êdî veguheriye xwebiştî, <sup>31</sup> ji ber ku hîna pirsgerêka man û nemanê nehatiye çareserkirin, ev qad wek qadeke talî tê dîtin û mirov dikare bibêje ku xemsariyek li hemberî vê qadê çêbûye. Li gel siyaseta Kurd, sazî û dezgehên Kurd ên ku di qada civaka sivil de jî ne xwediyê helwesteke xurt in ji bo parastin û geşkirina Kurdî.

**Bê sazîbûn, Bêpargalî û Qelsbûna Hevkarî û Hevgirtinê:** Li gel ku civaka nivîsê û nivîskaran a Kurdî her roj hinekî din berfireh dibe jî, saziyên xurt ên bi kadroyên gihîştî nîn in. Hevgiriyeke xurt di navbera nivîskaran de tune ye, her kes bi awayekî serbixwe dixebite. Mafên ku tên xwestin, doza ku tê kirin wek doza kesan dimîne/tê hiştin û venaguhere doza gelekî. Ji bo teşwîqkirina nivîsandina bi Kurdî saziyên ku berhemên bi Kurdî binirxînin, xelat bikin an rexne bikin jî tune ne. Ji ber ku ji bo berhemên wan bertekeke/vegereke xurt li nivîskaran çênabe, nivîskar bi xwe jî di asta berhemên xwe baş nagihîjin, ji bo berhemdariyeke zêdetir nakevin nava hewldanê. Weşanxaneyên Kurdan ên ku karê xwe bi awayekî profesyonel dikin kêma in, gelek ji wan mafê telifê nadin nivîskaran, heta hinek ji wan ji bo weşandina pirtûkan pereyan ji nivîskaran digirin. Bi vî awayî jî gelek caran nivîskar û pirtûkên baş dernakevin pêş, nivîskarên ku dikarin piştgiriya aborî bidin weşanxaneyê û xerab bin jî berhemên wan derdikevin pêş û tên belavkirin.

Dîsa aliyekî xurt ê sazînebûnê jî nebûna derfetên aborî ye. Kurt û kurmancî; ji ber kêşe û arîşeyên zagonî, civakî û aborî, wek hemû karên din, damezirandina saziyan jî gelekî zehmet dibe. Dema ku li gel van bêderfetiyan hemûyan sazî tên damezirandin jî, êrîşên ku tên ser wan saziyan zêdetir bi awayekî sistematîk tên kirin û ew sazî rasterast dibin armanca êrîşan, li gel endamên xwe tên marjînalîzekirin, krîmînalîzekirin û terorîzekirin.

**Modernizasyon:** Di tîkiliya Kurdî ya bi dema modern re de pirsgerêk heye. Habîyata gel û zimên hatiye guhartin. Li gor jiyana nû, zimanê heyî lawaz dimîne. Di gelek waran de qalib û formên zimanekî din li ser Kurdî tên ferzkirin. Asoya ku di gelek berhemên Kurdî de tê afirandin ne Kurdî/Kurdewar e. Nezanîna zimanên biyanî ya nivîskarên Kurd dike ku nivîskarên cîhanê bi zimanê xwe wan nas nekin, ji ber ku pirtûkên Kurdî jî ji bo zimanên din kêma tên wergerandin, cîhan jî Kurdan û hêza Kurdî nas nake. Pirtûkên Kurdî yên ku hatine wergerandin jixwe kêma in. Li gel vê yekê jî, bi tenê nivîskarên Kurd ên ku tîkiliyên wan ên takekesî xurt in, bi der-

31 Her çî qas ev tîgîh bi awayekî berbelav bê bikaranîn jî, civaka nivîskarên Kurd vê tîgîhê napejirîne, her çî qas bişaftineke jixweber hebe jî, di bingehê de sedem ne sedemên 'xweyî' ne, sedemên vê yekê dîsa polîtîkayên ku hatine/tên sepandin in. Ango Kurd xwe nabîşêvin, di encama gelek kirinan de reng û rêbazên bişaftina wan a bi destê serdestan guheriye.



fetên xwe pirtûkên xwe werdigerînin zimanên wek Erebi, Farişi, Tirkî û Almanî. Bi vî awayî jî, mirov dikare bibêje ku ji berhemên baş zêdetir, berhemên nivîskarên xwedîhêz tî wêgerandin. Ev jî dibe sedema kêmnasîna Kurdan a gelên din an jî xerabnasîna wan. Nivîskarî wek xebateke manewî tê dîtin û kirin. Gelek caran nivîskarên Kurd ji bo vê ‘şiyariya’ xwe, xwe ji civakê cudatir û bilindtir dibînin. Ev yek dike ku qada nivîskariyê di nav civaka Kurd de elît bimîne/bixuye. Ruh û hestiyariya bi têkiliya ziman, dîrok û çanda Kurdî ya jinan xurtir e lê jin kêmnivîsin.

### **Çend Mînakên Bînpêkirina Mafên Zimanî**

Dewlet baş bi girîngiya qada nivîs û nivîskariyê dizane û bi gelek kirin û lêferzkirinê cuda bi îsrar û înyad dixwaze ku Kurd ji Kurdî dûr bikevin û dev jê berdin. Gavên biçûk ên qaşo ‘erênî’ yên ku hatine avêtin jî di bîngeha xwe de dîsa hewla rizandin û zirardayîna Kurdî, kelepora Kurdî û hişmendîya kurdîniyê ye.<sup>32</sup> Her roj êşên nû ji aştê êrîşên li hemberî Kurdî difûrin. Her çî qas di hinek qadên wek medyaya civakî û çapemeniya Kurdan de bibin rojev jî, mixabin dîsa bi heman hişmendîya êrîşkar û înkarker di çapemeniya giştî ya Tirkan de yan ev bûyer qet cih nagirin an jî bi rengekî cuda cih digirin. Bi dehan nivîskar tî girtin, pirtûk tî qedexekirin, bi ser weşanxaneyan de digirin, peykerên Ehmedê Xanî dirûxînin, navên park û sazîyan ên ku navê rewşenbîr û nivîskarên Kurd lê hatine kirin diguherînin û hwd. Çend ji van mînakên ku tenê di sala 2020’an de qewimîne ev in:

**08.12.2020:** Li gel ku bi zimanên wek Îngilîzî, Erebi, hwd girteyên Meclîsê tî tomarkirin jî, heta niha çend caran li Meclîsê gotin û hevokên bi Kurdî hatibin gotin wek “xxxxx” hatine tomarkirin. Piştî ku parlamenterên HDP’yê ev yek nepejirandin, Serokê Meclîsa Mezin a Tirkîyeyê daxuyanî da ku Kurdî wek zimanekî ku nayê zanîn tu caran li Meclîsê nehatiye tomarkirin. Di heman rojê de parlamentera HDP’yê Meral Daniş Beştas bi Kurdî axivî û wek “xxxxx” hat tomarkirin. Dîsa bi heman awayî Parlamenter Feleknaş Uca di 12.12.2020’an de bi Kurdî cejna êzdiyan pîroz kir lê gotinên wê yên bi Kurdî di girteyên Meclîsê de wek “xxxxx” hatin tomarkirin.

**03.12.2020:** 6 sal û 3 meh cezayê girtîgehê li nivîskar Gulgeş Deryaspî hat birîn.<sup>33</sup>

**20.11.2020:** Rêvebira Navenda PENa Kurd, Rêvebira Damezirîner a Komeleya Wêjekarên Kurd û endama Komeleya Rojnamegeran a Firatê Roza Metîna, Mehmet

32 Kadri Yıldırım, *Kültür Bakanlığı’nın Mem û Zin Çevirisine Eleştirel Bir Yaklaşım* (Stenbol: Weşanên Avesta, 2011); Ehmedê Xanî, *Mem û Zin* (Enqere: Weşanên Wezerata Çand û Turizmê ya Komara Tirkîyeyê, 2010).

33 Rudaw, “Dagehê 6 sal û 3 meh ceza da nivîskara Kurd,” 03.12.2020, <https://www.rudaw.net/kurmanci/kurdistan/0312202015>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.



Saît Arzû, Dîlan Aydın û mamosteyê Kurdî Mehmet Salîh Ongun hatin binçavkirin.<sup>34</sup> Ev kes ji ber ku wek nivîskar beşdarî civînekê bûbûn hatin binçavkirin û berdan. Lê dozên wan didomin, derketina wan a derve qedexe ye û divê bi awayekî periyodîk biçin qereqolan, destnîşanan bidin. Dîsa pitûkên wan hatine desteserkirin, endamtiya wan a komeleyên sivil û xebatên wan wek tawan hatine binavkirin.

**18.11.2020:** Rêvebirê Damezirîner ê Komeleya Wêjekarên Kurd û Endamê Navenda PENa Kurd Nezîr Çakan hat girtin.<sup>35</sup>

**26.06.2020:** Nivîskar Azad Zal, Nesrîn Navdar, Adil Qazî, Brahîm Xelîl Taş, Mehmet Devîren, lêkolîner Suphî Îzol, rojnameger Ayşe Kara hatin binçavkirin.<sup>36</sup> Li gel ku piştî demekê ew kes hatin berdan jî dozên wan didomin, derketina wan a derveyî Tirkîyeyê hatiye qedexekirin û divê hefteyê carekê biçin qereqolan û îsbat bikin ku nereviyane. Li malên van kesan gelek pirtûkên bi bandrolên Wezaretê Çandê wek 'delîl' hatin desteserkirin, endamtiya wan a Komeleya Nivîskaran û Komîsyona Nivîskaran wek tawan di angaştnameyên wan de cih girt. Bi van binçavkirinan re, di heman rojan de li nivîskar Feratê Dengizî 10 sal, Bahadîn Robar 8 sal, Mîrza Ronî 7 sal, Adil Başaran 7 sal cezayê girtîgehê hat birîn.

**22.06.2020:** Qeyûmê Şaredariya Batmanê nivîsên Kurdî ji ser kolan û tabelayan rakirin.<sup>37</sup>

**14.01.2020:** Her wekî ku bi salan şîrketên belavkariyê yê kovar û rojnameyan kovar û rojnameyên Kurdî belav nedikirin û niha jî nakin. Piştî ku PTT'yê biryar da ku ew dê pirtûken Selahattin Demirtaş (yek jê ji bo Kurdî hatiye wergerandin) belav nekin, gelek malper û pirtûkfiroşên din jî biryar dan ku ew dê gelek pirtûkên bi Kurdî nefiroşin. Berpîrsê giştî yê Weşanxaneyê Avestayê<sup>38</sup> Abdullah Keskin jî di hevpeyvînan xwe de balê dikişîne ser heman mijarê û dibêje ku sansureke fiilî pêk tê.<sup>39</sup>

34 Xwebûn, "Gelek parêzer hatin binçavkirin", 23.11.2020, <https://xwebun.org/nu-operasyonen-qirkirina-siyasi-benavber-didomin/>, dîroka gihîştinê: 23.12.2020; PEN International, "PEN International is alarmed at the reported arrest earlier today, 20 November, of three members of its Kurdish PEN Centre in Diyarbakir, south east Turkey," 20.11.2020, <https://pen-international.org/news/pen-international-is-alarmed-at-the-reported-arrest-earlier-today-20-november-of-three-members-of-its-kurdish-pen-centre-in-diyarbakir-south-east-turkey>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

35 Diyarname, "Nivîskar Nezîr Çakan hat tewaqîfkirin," 18.11.2020, <https://diyarname.com/news.php?Idx=49693>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

36 Rûpela Nû, "Weşanger û nivîskar Azad Zal hat girtin," 01.07.2020, <http://www.rupelanu.com/wesanger-u-niviskar-azad-zal-hat-girtin-11887h.htm>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020; Susma 24, "J&J Yayinevi sahibi Azad Zal gözaltına alındı," 26.06.2020, <https://susma24.com/jj-yayinevi-sahibi-azad-zal-gozaltina-alindi/>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

37 Gazete Duvar, "Batman'da kayyım yollardan Kürtçeyi kaldırdı," 22.06.2020, <https://www.gazeteduvar.com.tr/gundem/2020/06/22/batmanda-kayyim-yollardan-kurtceyi-kaldirdi>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

38 Weşanxaneyê Avestayê ya ku navenda wê li Stenbolê ye, di 1995'an de hatiye damezirandin û heta niha bi sedan pirtûkên bi Kurdî çap kirine û di nava weşangerên Kurd de xwediyê cihêkî taybet e. Binihêrin: <https://www.avestakitap.com/>

39 Independent Türkçe, "Çözüm sürecinden sonra çıkmaza giren Kürt yayıncılığı yeni bir çıkış arıyor," 28.10.2020, <https://www.indyurk.com/node/263826/çözüm-sürecinden-sonra-çıkmaza-giren-kürt-yayıncılığı-yeni-bir-çıkış-arıyor>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020

## Pêşniyazên Çareseriyê

Di encama xebatên çavdêriyê de, pêşniyazên ku hatine kirin li jêrê di bin banê du serenavan de hatine senifandin: Pêşniyazên ji bo reformên siyasî û pêşniyazên ji bo aktorên civaka sivil.

## Pêşniyazên ji bo reformên siyasî

Nivîskar û rewşenbîrên Kurdan ji bo xurtkirina mafên zimanî li Tirkîyeyê bi giranî balê dikişînin ser pêdiviya bi reformên siyasî. Di vî warî de pêşniyazên sereke ev in:

**Naskirina ziman û nasnameya Kurdî bi awayekî zagonî:** Ev pirsgerêkên ku hatine gotin hemû bi pejirandin û nepejirandina nasnameya Kurd ve têkildar in. Ji ber vê yekê beriya pêşiyê, divê hebûna Kurdan bi awayekî fermî bê nas-kirin û Kurdî jî bibe xwediyê statuyêke fermî da ku normalîzasyon dest pê bike. Ev yek divê bi guherandina Destûra Bingehîn a Tirkîyeyê were kirin. Her wiha divê dewlet bêyî tu şert û mercan, bêyî dûreparêzî û îtîrazan hemû peyman û daxuyaniyên navneteweyî yên derbarê mafên nasname, ziman û çandê de bipejirîne û pêdiviyên wan bi cih bîne.

**Perwerdehiya bi Kurdî:** Heke ku guherandina Destûra Bingehîn dirêj biao jî, divê Wezaretên Perwerdehî û Çandê bi guherînên biçûk ên di sepanên xwe de perwerdehiya Kurdî û bi Kurdî ji destpêka dibistanê de bidin destpêkirin û piştgiriya bidin hemû cure sazî û xebatên ji bo ziman û çanda Kurdî.

**Cudakariya erênî ya ji bo Kurdî:** Divê ji bo Kurdî cudakariyêke erênî were kirin û piştgirî ji bo nivîskar û weşanxaneyan bê dayîn.

**Xurtkirina mafên xweîfadekirinê û rakirina qedexeyan:** Divê mafê xweîfadekirinê were xurtkirin. Ji bo vê yekê jî peymanên navneteweyî yên derbarê vê yekê de bîna naskirin û mewzûata navxweyî bê nûkirin. Mafê xweîfadekirinê divê mafê bikaranîna zimanî jî bihewîne. Nivîskarên ku ji ber mafê xwe yên xweîfadekirinê bi kar anîne yan jî beşdarî xebatên siyasî bûne divê bîna berdan. Her wiha divê qedexekirina pirtûkan bi dawî bibe û qedexeyên li ser pirtûkên Kurdî rabin.

## Pêşniyaz ji bo aktorên civaka sivil

Li gel pêşniyazên ji bo reformên siyasî, beşdaran ji bo aktorên civaka sivil jî hin pêşniyaz kirin. Pêşniyazên sereke yên ji bo aktorên civaka sivil ev in:

**Parêzvaniyeke neteweyî û navneteweyî:** Divê sazî û dezgehên nivîskaran veguherin eniyeke pêşeng a ku ji bo vê yekê li çar aliyên cîhanê dîplomasiyeke xurt bike. Divê di nava ber û aliyên ziman û çanda Kurdî de hevgeriyek çêbibe, hêzeke xurt çêbibe da ku dewletê neçar bike hinek gavan bavêje. Li gel pêkutîya ku dê li ser dewletê bê kirin, divê hemû aktor û saziyên sîvîl hewl bidin ku piştgirîya hêzên navneteweyî bigirin, ew jî bikin ku dewlet peyman û daxuyaniyên mafan ên ku wan afirandine bisepîne.

Ji bo ku daxwaza bikaranîna Kurdî ya di her qadê de bi awayekî xurtir bê kirin, divê ji gel bi milyonan îmze bînin komkirin û bi wan îmzeyan li Tirkîyeyê û tevahiya cîhanê serlêdanên fermî bînin kirin. Divê şik û gumanên derbarê xurtîya wêjeya Kurdî de yê di dil û hişê Kurdan de bi xebatên cur bi cur ên danasînê ji holê bînin rakirin. Pêşdaraziyên ku li hemberî Kurdî hatine çêkirin, werin pûçkirin. Ev yek jî bi perwerdehî, kargeh, semîner, panel û hwd ên zindî û onlîne dikare were kirin. Divê bi her awayî li ser dewletê û saziyên dewletê pêkutî çêbibe da ku neçar bimînin Kurdî bipejirînin, bi kar bînin. Divê hemû nivîskar û weşanger ji bo hemû pirtûkên xwe daxwaza piştgiriyê ji dewletê bikin ku çap bikin, li pirtûkxaneyan belav bikin û hwd. Divê bi awayekî de fakto rewşek derkeve holê ku zanîna bi xwendin û nivîsîna Kurdî wek taybetîyeke erênî ji bo peydekirina kar bê dîtin.

**Duzimaniyeke de facto di sazî û dezgehên sîvîl û siyasî de:** Divê sazî û partiyên Kurdan bêyî ku li benda tu guherînan di zagonan de bisekinin, demildest di hemû kar û xebatên xwe de duzimaniyê bisepînin. Ev sepan dê hem naskirineke xurt û hem jî xwedîderketineke xurt a li Kurdî çêbike û ev xwedîderketin dê bibe yek ji nîşaneyên herî mezin a rizgarkirina Kurdî ya ji hemû qeyd û bendan. Divê êrîş û polîtîkayên parêzger û qeyûman ên li ser Kurdî bînin rawestandî da ku Kurd bixwe jî ji Kurdî netirsînin, Kurdî wek tiştê kê derasayî nebînin, her kes xwedî lê derkeve û pê bijî. Wek polîtîkayeke navxweyî ya parastina Kurdî ya ji zimanê serdest, divê kesên ku bi Kurdî nizanibin di saziyên sîvîl ên ziman û çandê yê Kurdan de cih negirin. Çi Kurd, çi jî ne Kurd kesên ku di van saziyan de cih bigirin divê zimanê serdest li wê saziyê ferz nekin.

Bilindkirina prestîja Kurdî di nava gel de: Hemû sazî, rewşenbîr û pêşengên Kurdan divê ji bo bilindkirina prestîja Kurdî hewl bidin. Ji bo ku nivîskarên Kurd bi tenê nivîskariyê bikin û hemû hêz û dema xwe ji nivîsînê re terxan bikin, divê di sazî û dezgehên Kurdan de bînin îstîhdamkirin. Her wiha divê nivîskar û hunermendên ku karê xwe bi Kurdî dikin werin teqêrkirin, xelatkirin, rê li wan were vekirin, derbarê polîtîkayên giştî de jî teqez guhdariya fikr û pêşniyazên wan bê kirin.

Bikaranîna çapemenî û ragihandinê ji bo xurtkirina hişmendiye: Divê çapemenî û ragihandineke di warê ziman û çandê de zana, şiyar û çalak çêbibe. Ji ber ku perwerdehiya giştî tune ye, pira herî qewî ya di navbera saziyan û gel de çapemenî ye. Divê çapemenî bi vê hişyariyê tevbigere û zimanê ku ji aliyê nivîskaran ve tê bikaranîn û bipêxistin bikaribe bigihîne gel.

## **Serencam**

Di vê rapora li ber destên we de, me hewl da ku bi awayekî kurt, çarçoveyeke giştî ya rewşa nivîsîn û nivîskariya Kurdî ya li Tirkîyeyê vebêjin. Ji bo vê xebatê civîneke fokûsê ya bi nivîskarên Kurd re, du civînên navneteweyî yên ku nivîskarên Kurd jî beşdar bûbûnê yên li ser înternetê, lêkolînên qadî û hevpeyvînên rû bi rû me ji xwe re kirin bingeh. Me hewl da ku em girîngiya vê qadê, di asta xwecihî û navneteweyî de mîsyona ku li vê qadê û xebatên wê tê barkirin, pirsgirêkên sereke yên di vê qadê de, kêşe û barîyerên li ber aktor û aktîvistên vê qadê, pêşniyazên çareseriyê yên qadî û giştî bi hinek mînakên vebêjin.

Wek ku di vê kurteraporê de jî bi gelek mînak û awayên cuda hatiye destnîşankirin, ji bo parastina ziman û çandekê, her wekî qadên perwerdehî û ragihandinê, qada nivîsîn û nivîskariyê jî yek ji hêmanên bingehîn e. Ji bo ku ziman û çandek geştir bibin, asoya ramanê berfirehtir bibe, sînorên jiyane bê-sînor bibin, hem ji aliyê endamên gelê xwediyê wî ziman û çandê ve û hem jî ji aliyê tevahiya cihanê ve bînan nasîn, qada nivîskariyê qada ku herî zêde bar dikeve ser milan e. Ji lewra divê rê li ber vê qadê bînan vekirin, derfet ji xwebexş û karbidestên vê qadê re bînan afirandin, xebatên wan bînan nasandin û berbelavkirin. Bi vî awayî hişmendiyeke hevpar a giştî çêdibe, bi vê hişmendiye qeyd û bend tînan qetandin û bi pêşengiya ronakbîriyê civak xwe digihîne ronahiyê.

## Çavkanî

Altûn Demîr, Netîce, “Zimanê Dayîkê, Girîngiya Wî, Têkoşîna ku li Tirkîyeyê Tê Dayîn, Xebatên ku Hatine Kirin,” *Jineoloji* 13 (2019): 127-138.

Bianet, “Diyarname: Di Sala 2019ê de 252 Pirtûk bi Kurdî Hatine Çapkirin,” 02.01.2020, <https://m.bianet.org/bianet/pirtuk/217971-diyarname-di-sala-2019e-de-252-pirtuk-bi-kurdi-hatine-capkirin>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

Council of Europe, “European Charter for Regional or Minority Languages,” 5.11. 1992, <https://www.coe.int/en/web/conventions/full-list/-/conventions/rms/0900001680695175>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, “European Convention on Human Rights,” 4.11.1950,

[https://www.echr.coe.int/Documents/Convention\\_ENG.pdf](https://www.echr.coe.int/Documents/Convention_ENG.pdf), dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, “Framework Convention for the Protection of National Minorities,” 1.11.1995, <https://www.coe.int/en/web/conventions/full-list/-/conventions/rms/090000168007cdac>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

Dede, Savaş, *Rapora Tenduristî û Mafên Zimanî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020)

-----, *Rapora Zarok û Mafên Zimanî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020).

Diyarname, “2018: Hemû Pirtûkên bi Kurdî yên ku Îsal Derketine,” 31.12.2018,

<https://diyarname.com/news.php?Idx=33986>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

-----, “Nivîskar Nezîr Çakan hat tewqîfkirin,” 18.11.2020,

<https://diyarname.com/news.php?Idx=49693>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

European Court of Human Rights, 2020. “Overview 1959-2019,” 2020,

[https://echr.coe.int/Documents/Overview\\_19592019\\_ENG.pdf](https://echr.coe.int/Documents/Overview_19592019_ENG.pdf), dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

Fîdan, Omer, *Navendeke Çalak a PENa Navneteweyî: Navenda PENa Kurd*, <https://pen-kurd.org/despek/>, 15.12.2019, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, *Nirxandîna Rapirsîna Tora Ziman û Çanda Kurdî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020).

-----, *Rewşa Ziman û Perwerdehiya bi Kurdî li Tirkîyeyê* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020).

-----, *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayîkê û Bikaranîna Wî* (Amed: Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, 2020).

Gazete Duvar, “Batman’da kayyım yollardan Kürtçeyi kaldırdı,” 22.06.2020,

<https://www.gazeteduvar.com.tr/gundem/2020/06/22/batmanda-kayyim-yollardan-kurtceyi-kaldirdi>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

Independent Türkçe, “Çözüm sürecinden sonra çıkmaza giren Kürt yayıncılığı yeni bir çıkış arıyor,” 28.10.2020, <https://www.indytrk.com/node/263826/çözüm-sürecinden-sonra-çıkmaza-giren-kürt-yayıncılığı-yeni-bir-çıkış-ariyor>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

İnsan Hakları Derneği, “OHAL’de Türkiye Raporu” 26.10.2017,

<https://www.ihd.org.tr/ihd-istanbul-subesi-ohalde-turkiye-raporu>, dîroka gihîştinê 26.12.2020.

Jin News, “PENa Kurd ji bo Roja Nivîskarên di Zindanan de bername li dar xist,” 13.11.2020,

<http://www.jinnews16.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/150883?page=18>, dîroka gihîştinê: 23.12.2020

Mezopotamya Ajansi, “Rayedaran 3o qolî pirtûkên girtîyan nedan wan û paşve şandin” 02.10.2020, <http://mezopotamyaajansi24.com/kr/HEM-NCE/content/view/111269>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

MedMuzîk, “Vaye lîsteya pirtûkên kurdî yên di 2020’an de hatine çapkirin”, 01.01.2021, <http://medmuzik.tv/vaye-listeya-pirtuken-kurdi-yen-di-2020an-de-hatine-capkirin/> dîroka gihîştinê: 01.02.2021

Navenda PENa Kurd, “Pirtûkên li Bakur hatine qedexekirin”, 15.11.2020,

<https://pen-kurd.org/pirtuken-li-bakur-hatine-qedexekirin/> dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

PEN International, “PEN International is alarmed at the reported arrest earlier today, 20 November, of three members of its Kurdish PEN Centre in Diyarbakir, south east Turkey,” 20.11.2020,

<https://pen-international.org/news/pen-international-is-alarmed-at-the-reported-arrest-earlier-today-20-november-of-three-members-of-its-kurdish-pen-centre-in-diyarbakir-south-east-turkey>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

Rudaw, “Dadgehê 6 sal û 3 meh ceza da nivîskara Kurd,” 03.12.2020,

<https://www.rudaw.net/kurmanci/kurdistan/0312202015>, dîroka gihîştinê: 21.12.2020.

Rûpela Nû, “Weşanger û nivîskar Azad Zal hat girtin,” 01.07.2020,

<http://www.rupelanu.com/wesanger-u-niviskar-azad-zal-hat-girtin-11887h.htm>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

Skutnabb-Kangas, Tove & Phillipson, Robert, “Linguicide and Linguicism”, R. Phillipson & T. Skutnabb-Kangas (Eds.), *Papers in European language Policy*. Roskilde: Roskilde Universitets center, Lingvistgruppen, 1995), 83-91.

Susma 24, “J&J Yayinevi sahibi Azad Zal gözaltına alındı,” 26.06.2020,

<https://susma24.com/jj-yayinevi-sahibi-azad-zal-gozaltina-alindi/>, dîroka gihîştinê: 22.12.2020.

United Nations, “International Convention on the Elimination of All Forms of Racial Discrimination,” 21.12.2020,

<https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/cerd.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, “International Covenant on Civil and Political Rights,” 16.12.1966,

<https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/ccpr.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, “Universal Declaration of Human Rights,” 10.12.1948, <https://www.un.org/en/universal-declaration-human-rights/>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

-----, “Convention on the Rights of the Child,” 20.11.1989, <https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/crc.aspx>, dîroka gihîştinê: 26.12.2020.

Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn* (Enqere: Weşanên Wezerata Çand û Turizmê ya Komara Tirkîyeyê, 2010).

Xwebûn, “Gelek parêzer hatin binçavkirin”, 23.11.2020, <https://xwebun.org/nu-operasyonen-qirkirina-siyasi-benavber-didomin/>, dîroka gihîştinê: 23.12.2020.

Yıldırım, Kadri, *Kültür Bakanlığı'nın Mem û Zîn Çevirisine Eleştirel Bir Yaklaşım* (Stenbol: Weşanên Avesta, 2011).

## **Pêvek 01: Nivîskarên Kurdînûs ên di Girtîgehan de**

Bi vê xebata ku di demeke kin de bi alîkarî, hewl û kedeke mezin a Navenda PENa Kurd hatî kirin, bi qasî ku me dikaribû û em hîn bûn, 43 nivîskarên Kurdên kubi Kurdîdinivîsin hîna jî di girtîgehê de ne.

1. **A. Hamit Orbay:** 2. Girtîgeha Girtî ya Tîpa F ya Tekirdagê (2 Nolu F Tipi Kapalı Cezavi Tekirdağ)
2. **A. Menaf Osman:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Akhisar/MANİSA (T-Tipi Kapalı C. Evi-C/8 Akhisar/MANİSA)
3. **Abdullah Babat:** 2. Saziya Înfazê ya Cezayê Giran a Enqere/Sîncan (Ankara/Sincan 2 Nolu F Tipi Kapalı Ceza İnfaz Kurumu)
4. **Ahmed Gerez:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T ya Beşikduzu/Trabzon (Trabzon Beşikdüzü T Tipi Kapalı Cezaevi)
5. **Ahmed Huseyîn:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Kandirayê (Kandıra T Tipi Kapalı Cezaevi)
6. **Ali Alp:** 2. Saziya Înfaza Ceza ya Girtî ya Yenî Şakran Îzmîr/Alîaga (Yeni Şakran 2 nolu T Tipi Kapalı Ceza İnfaz İzmir/Alıağa)
7. **Ali Koç:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Karabükê (T Tipi Kapalı Cezaevi Karabük)
8. **Burhan Eviz:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Eşen Fethiye/Mugla (Eşen T Tipi Kapalı Cezaevi/ Muğla Fethiye)
9. **Cebrail Ancar:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Îskenderûnê (İskenderun T Tipi Kapalı Cezaevi)
10. **Cengiz Eker:** 3. Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Şakran/Îzmîr (3 Nolu T Tipi Kapalı Cezaevi Şakran / İzmir)
11. **Erdoğan Uçar:** 3. Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Şakranê ( Şakran 3 Nolu T Tipi Kapalı Cezaevi Şakran/İzmir)
12. **Fecriye Benek:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa M a Bayburtê (M Tipi Kapalı Cezaevi Bayburt)
13. **Haci Nahsan:** 2. Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F /A Blok/Tekirdag (2 Nolu F tipi Yüksek Güvenlikli Cezaevi A Blok Tekirdağ)
14. **Huseyîn Duman:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa T ya Burhanyê ( T kapalı cezaevi Balıkesir Burhaniye)
15. **İdris Erenç:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Alîaga/Îzmîr (Alıağa F Tipi Kapalı Cezaevi İzmir)
16. **İskender Karaman:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Tekirdagê (Tekirdağ F Tîpî Kapalı Cezaevi)



17. **Kerem Bilen:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Trabzonê (E Tipi Kapalı Cezaevi Trabzon)
18. **Laleş Çeliker:** 1. Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Tekirdagê (Tekirdağ 1 No'lu F Tipi Kapalı Cezaevi)
19. **Leyla Atabay:** Girtîgeha Tîpa E ya Elbistan/Maraş (Elbistan E Tipi cezaevi Maraş)
20. **Mahmut Aslan:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Metrisê (Metris E Tipi Kapalı Cezaevi)
21. **Mahmut Baran:** 3. Girtîgeha Tîpa T ya Şakranê Aliaga/Îzmîr (ŞAKRAN 3 No'lu T Tipi Cezaevi C-15. Aliğa/İzmir)
22. **Mahmut Yamalak:** 2. Girtîgeha Girtî ya Tîpa T ya Bunyan / Kayseriyê (2 Nolu T Tipi Kapalı Cezaevi Bünyan/Kayseri)
23. **Medya Yaklav:** Girtîgeha Jinan a Sîncana Enqereyê (Sîncan Kadın Cezaevi)
24. **Mehmet Alî Yaşa:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Aliaga/Îzmîr (Alîğa F Tipi Kapalı Cezaevi İzmir)
25. **Mizgîn Ronak (Mizgîn Aydın):** Girtîgeha Tîpa M a Gebzeyê (Gebze M Tîpî Cezaevi)
26. **Muhammed İnal:** 1. Girtîgeha Tîpa F a Kandirayê (Kandıra 1 nolu F tipi cezaevi)
27. **Murat Turk:** Girtîgeha Tîpa F a Kandirayê (Kandıra F Tipi Cezaevi)
28. **Necmettin Tural:** 1. Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Tekidargê (1 Nolu F Tipi Kapalı Cezavi Tekirdağ)
29. **Orhan Sakci:** Girtîgeha Şakranê ya Nû ya Aliaga/ÎZMÎR (Yeni şakran cezaevi kampusu T3 9. Koguş Aliaga/ÎZMÎR)
30. **Ramazan Çeper:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Edirneyê (Edirne F Tipi Kapalı Cezaevi)
31. **Rıza Kazici:** Navê Berhemê (Ez ê We me): Di 2015'an de li Girtîgeha Kandirayê jiyana xwe ji dest da.
32. **Rizgar Turhan:** Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Afyonê (E Tipi Kapalı Cezaevi Afyon)
33. **Rojbîn Perîşan:** Girtîgeha Girtî ya Jinê ya Tîpa M a Gebzeyê (Gebze M Tipi Kadın Kapalı Hapishanesi)
34. **Servet Ozkan:** Girtîgeha Girtî ya Ewlehiya Bilind a Wanê (Van Yüksek Güvenlikli Kapalı Cezaevi VAN)
35. **Sinan Sutupak:** Saziya Înfazê ya Girtîgeha Girtî ya Tîpa E a Elbistan /Meraş (Kahraman Maraş Elbistan E Tipi Kapalı Ceza İnfaz Kurumu)
36. **Teyfik Hêja (Teyfik Yaşli):** Girtîgeha Tîpa F a Boluyê (Bolu F Tipi Cezaevi Bolu)



37. **Yaşar Aslan:** 2. Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F /A Blok/Tekirdag (2 Nolu F tipi Yuksek Guvenlikli Cezaevi A Blok Tekirdağ)
38. **Nezir Çakan:** 3. Girtîgeha Tîpa L a Sîncana Enqereyê (Ankara Sincan 3 Nolu L Tipi Cezaevi)
39. **Mistefa Tûnçyuzlu:** Girtîgeha Şakranê ya Tîpa T a Alîagaya Îzmîrê
40. **Osman Kapan:** Girtîgeha Bolûyê ya Tîpa F
41. **Lokman Aslan:** Girtîgeha Panosê ya Tîpa L a Agiriyê
42. **Huseyîn Guçlu:** 2'yemîn Girtîgeha Şakranê ya Tîpa K a Alîagaya Îzmîrê
43. **Cahît Baskara:**

## **Pêvek 02: Hinek Pirtûkên Kurdî yên li Tirkîyeyê Hatine Qedexekirin**

Di salên dawî de gelek pirtûkên kurdî ku ji weşanxaneyên kurd wekî J&J, Name, Ar, Avesta, Aram, Sîtav hatibûn çapkirin hatin qedexekirin. Ev pirtûk bêtir bi hinceta “Propagandaya rêxistinê” hatine qedexekirin. Li gel qedexeyan carina cezayê pereyan li weşanxaneyan tên birîn. Wekî mînak, der barê pirtûka Mehmet Alî Yaşa ya bi navê Sorgulên Şevê ya ji aliyê Weşanxaneya Sîtavê hat çapkirin de di sala 2015'an de doz hat vekirin û 33.300 TL cezayê pereyan dane weşanxaneyê. Di pûşpera 2019'an de Dadgeha Bilind ev ceza erê kir. Niha her meh Weşanxaneya Sîtavê vî cezayî dide. Lê pirtûk nehat qedexekirin. Her wiha sedema qedexekirina pirtûkan qet ji Weşanxaneya Sîtavê re nehatiye gotin. Her sê pirtûkên Mizgîn Ronak ev salek e hatine qedexekirin, ji bo qedexeya wan hatin bi ser Weşanxaneya Sîtavê de jî girtin, lê sedema qedexeyê ji weşanxaneyê re nehat gotin û ji weşanxaneyê re teblîxat nehatiye ku qedexe bûne. Weşanxaneya Sîtavê pirtûk şandibû zindanê, paşê polîsan bi ser Weşanxaneya Sîtavê û mala xwediyê Weşanxaneya Sîtavê Qahir Bateyî de girtin û gotin we ev her sê pirtûkên qedexe şandine zindanê. Bi vî awayî Qahir Bateyî pê hesiyaye ku her sê pirtûk qedexe bûne.

Li gor daneyên ku me bi dest xistine ji Weşanxaneya Aramê 88, ji Weşanxaneya J&J'yê 3, ji Weşanxaneya Arê 1, ji Weşanxaneya Nameyê 1, ji Weşanxaneya Sîtavê 4, ji Weşanxaneya Avestayê jî 12 pirtûk, bi giştî 109 pirtûk hatine qedexekirin. Ji van pirtûkan 31 bi kurdî ne. Ev pirtûkên ku bi kurdî ne û hatine qedexekirin ev in:

### **Pirtûkên qedexekirî yên Weşanxaneya Sîtavê**

1. ***Nobedarê Gulên Kobanê***, Nivîskar: Mizgîn Ronak, Sala qedexebûnê: 2018
2. ***Rojhat***, Nivîskar: Mizgîn Ronak, Sala qedexebûnê: 2018
3. ***Gorçiya Ne Em***, Nivîskar: Mizgîn Ronak, Sala qedexebûnê: 2018

### **Pirtûkên qedexekirî yên Weşanxaneya Avestayê**

1. ***Tevgera Neteweyî ya Kurd***, Nivîskar: Chris Kurschera, Wergera ji Frensî: Fikret Başkaya, Sala qedexebûnê: 2018
2. ***Kurd û Kurdistan***, Nivîskar: Abdurahman Qasimlo, Wergera ji Îngilîzî: Îbrahîm Bîngol, Sala qedexebûnê: 2018
3. ***Serîhildana Gelê Kurd 1880 Şêx Ubeydullahê Nehrî***, Nivîskar: Celîlê Celîl,

Wergera ji Rûsî: Yaşar Abdulselamoglu

4. **Pûsûlayên Rayan û Baweriyên bi Xwîn, Rêvebirina Neteweyîya Kurd a li Tirkîyeyê**, Nivîskar: Robert Olson, Sala qedexebûnê: 2018

5. **Rêwitiya Welatê Mêrên Wêrek**, Nivîskar: Dana Adams Schmidt, Sala qedexebûnê: 2018

6. **Komara Kurd a Mehabadê, Di Polîtîkayên Hêzên Mezin de Kurd**, Nivîskar: Borhaneddin A. Yassin, Sala qedexebûnê: 2018

7. **Li Kurdên Swêd û Fransayê Avakirina Dîasporayê û Têkiliyên Netewbûn-Jêwêde**, Nivîskar: Khalid Khayati, Sala qedexebûnê: 2018

8. **Li Welatê Min Xerîbek, Polîtîkayên Aîdiyetê Yên Ciwanên Kurd ên Swêdê**, Nivîskar: Barzoo Eliassi, Sala qedexebûnê: 2018

9. **Di Şerê Çaldiranê de Osmanî**, Safevî û Kurd, Tifaqa Yekem a Kurd û Osmaniyan, Nivîskar: Murad Ciwan, Sala qedexebûnê: 2018

10. **Ji Dîroka Yezidiyan Helbest û Ravekirinên Dîrokî**, Nivîskar: Philip G. Kreyenbroek & Xelil Cindi Reşow, Sala qedexebûnê: 2018

11. **Di Bin Ala Kurdistanê de Çalakî û Jiyana Mustafa Barzanî**, Nivîskar: Xoşevi Babekr/Pauel Shethman, Sala qedexebûnê: 2018

12. **Li Iraqê Komkujî, Tevgera Leşkerî Ya Li Dijî Kurdan Hat Ajotin**, Nivîskar: Middle East Watch, Sala qedexebûnê: 2018

### Pirtûkên qedexekirî yên Weşanxaneyê Aramê

1. **Hawar**, Nivîskar: Ali Oruç, Sala qedexebûnê: 2016

2. **Geliyê Zîlan Jêderka Jin û Janê**, Nivîskar: Devrim Serhad, Sala qedexebûnê: 2016

3. **Vakayiname**, Nivîskar: Mûsa Anter, Sala qedexebûnê: 2016

4. **Rojhilata Navîn**, Nivîskar: Rustem Cûdî, Sala qedexebûnê: 2016

5. **Em Bûn Baran**, Nivîskar: Mizgîn Ronak, Sala qedexebûnê: 2016

6. **Gedeyê Şîrîn**, Nivîskar: Nîzametîn Akkurt, Sala qedexebûnê: 2016

7. **Hedera Henaseyên Azad (Bîranînên Gêrîla)**, Sala qedexebûnê: 2016

8. **Rojnivîsa Hevaltiyê**, Nivîskar: Bêrîtan Hîlal, Sala qedexebûnê: 2016

9. **Şaristani û Nijadperestî**, Nivîskar: Osman Ozçelik, Sala qedexebûnê: 2017

10. **Girê Şêran Serhildan**, Nivîskar: Menaf Osman, Sala qedexebûnê: 2017

11. **Bênav**, Nivîskar: Husên Engîzek, Sala qedexebûnê: 2018

12. **Qêrîn**, Nivîskar: Xezal Îke, Sala qedexebûnê: 2018

13. **Îdeolojî**, Nivîskar: Rustem Cûdî, Sala qedexebûnê: 2016

**Pirtûkên qedexekirî yên Weşanxaneyê J&J'yê**

1. *Rûpelên Binaxkirî*, Nivîskar: Faysal Ozdemîr, Sala qedexebûnê: 2016
2. *Evîna Rojdayê*, Nivîskar: Faysal Ozdemîr, Sala qedexebûnê: 2016

**Pirtûkên qedexekirî yên Weşanxaneyê Nameyê**

1. *Hêviyên Winda*, Nivîskar: Welat Xerîb, Sala qedexebûnê: 2019



Web: [www.torakurdi.org](http://www.torakurdi.org)  
E-mail: [info@torakurdi.org](mailto:info@torakurdi.org)